

## Armancên Şerê Geze Çi ne?..

Xemxarê Welêt

Berî hertiştî, dema mirov kuştina mirovine din dibîne, hema çawa û kî dibe bila be; Hestên mirovaniyê di wî de dilivin, dil xemgîn dibe û pê dêşe jî. Vêja ne hîn ên tîn kuştin ji kesên sêvîl, zarok, jin û kalemêran bin; Wê hîngê êş û xemgîniya morov her dere pirtir dibe. Wê lomê em bi vê şerê Gezê ne razîne, em wê şermezar dikin, û dibêjin : Bi çi awayî dibe , gerek were rawestandî. Ji ber ku ev şer di navêna leşkerê Israîl û Tevgera Hamas – ew ê ku li nav xelkê Gezê yê sêvîl -de ye, û di rewşeke weha de, piraniya kesên tîne kuştin û tarûmarkirin, zarok, jin û kalemêr in .

Di baweriya me de, ev şer ji xwe berê pêk nehatî, belê pir sedemên ku hîştine pêk were hene, herweha pilankirinek ji mêj ve jê re hebû, û armancên dût û nêzîk jî yên wê hene, EW jî bi kurtahî ev in :

- Armancên nêzîk û yekser : 1- Divê saroxên Qesam û Girad yên ku Tevgera Hamas davêje Isra,îl werin rawestandî. 2- Divê derbasgehên di navêna Misir û Gezê de, di bin çvdêriya hêzên nevnêwî de bin, yanê ew nemînin

### Fermana 59an a 2008 an

Tiştên em zanin li welatên li pêş demoqrasî û mirovên wê maf parastî ne. Ne ji mafê tu hêz ewlekariyê ye ku, mafê tu kesî bin pê bike û biqoprîne an sînorên wî derbas bike . Eger li hin ciyan bibe jî , ew kes dikare giliyeke xwe ye sezayî li pêş dadgehekê, li wê hêza ewlekariyê rake.

Li Sûriyê, erê mafê gilîhildanê li dijî hêzên ewlekariyê -mîna emin eldewlê ,emin eleskerî,emin elcewî û emin elsiyasî ne ji mafê tu kesî bû. Yanê ji mafê wan hêzan bû ku, mafê çi kesî be bin pê bike û her sînor û xêzên sor jî derbas bike.Lê, wî kesî nikarî tu gilî sezayî bikra. Herweha

ciyên derbaskirina çekan ji Tevgera Hamas re.

- Armancên dût: 1- Kokirina rola hêzên Islamî yên hişkbawer, mîna Îran, Sûriyê, Hizib-Elah , Tevgera Hamas.... û H.W.D, li Rojhilatanavîn. 2- Geşkirina rola hin dewletên dî li herêmê, mîna Turkiyê, Isra,îl, destlata Felestînî ya rêdankirî, û dibe di paşerojê de ji nû ve rola Îranê jî jê re vegeînin.

Yanê ji nû ve, pirojeya Rpjhilata Navîn a nû nûjen dibe, û belkî rojek bê, tu rol dewletên Ereb nemîne, û tevger û hêzên Islamî yên bawerhişk wek entîkan bibin.

Li dawî em bawerin, ku Isra,îl û Felestîn hevçîwarê hev ên rasteqînin, divê bi aştiyane weke du dewletên cîran, îro û sibe jî bi hev re bijîn. Û em bawerin jî, Ku ev şer nayê rawestandî, bêyî ku bi kêmanî , ew armancên nêzîk û yekser bi cî werin.

Dîsa li ber ronîya nêrîn û helwestên me yên jorîn, em deng û banga xwe tevî yên doza rawestandîna şer dikin dikin. Ji ber ku em hertim haval û piştgirê aşî û hêminiya cîhanê – bi taybetî Rojhilata Navîn - tev in.

mersuma jorîn, ev rêdan da hêza polîsê (şurta) û gumrikê jî. Yanê wek hêzên ewlekariyê yê nberê,kanin destdirêjiyan di mafên pîroz yên her welatîyekî de bikin .Ew jî nikane giliyeke sezayî di riya parêzerekî re li wan veke û doza mafê xwe bike, berî ku erêkirineke pêşda ji şalyarê bergiriyê bibe.

De ka, em ji serokomarê Sûriyê -xudiyê vê mersûmê- bipirsin ka sedemên vê mersûmê çi ne? Çi tişt evqas pêwîst heye ,hşt hûn van destdirêjiyên zêde bidin van hêzan? Û bi çi mafî hûn hemwelatîyên vê welatî yên bêçare ,bê maf û serdaxistî dikin?.